توزع مجـــــاناً

LI ROJAVA DIYARDEYA ZAROKÊN DI BIN KAR DE

Welat
01/09/2018
Çandî - Gîştî - Serbixwe
54

DAGÎRKERÊN EFRÎNÊ WÊ RÛREŞIYÊ BI DEST BIXIN

Welat

welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat
ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة
العدد (٥٤) ٢٠١٨/٩/١ م

PEYVA WELAT

Welat
ÇANDÎ- GIŞTÎ- MEHANE

Kovara **WELAT**
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Dagîrkerên Efrînê wê rûreşiyê bi dest bixin

Desteya sernivîs

Şeş meh di ser dagîrkirina Efrînê re derbas dibin, şeş mehên xwînî ku di wan de hemû kiryarên hovane ji alî artêşa turk û çeteyên bi ser wê ve li dijî kurdan hatin bi kar anîn, û hemû zagon û nirxên mirovî hatin binpêkirin.

Li gorî yaseya navdewletî, hêzên dagîrkir di ber parastin û ewlehiya nîştecihên devera dagîrkirî de berpirs in, lê li Efrînê ji roja ku hatiye dagîrkirin heya îro roj rewşa nîştecihên wê û bi taybet a kurdên Efrînê roj bi roj xerabtir û aloztir dibe.

Li şûna ku artêşa turk a dagîrker aramiyê li Efrînê cîbicî bike, ew dever bi destê mîlîsên Islamî yên radîkal ve berdaye. Ew milîsên ku ji kurtêlxwerên Sûrî û bermahiyên Daişê pêkhatine û di bin siya artêşa turk û parastina wê de debasî xaka Efrînê hatin kirin, ev milîsên bê nirx û rewişt, ev terrorist bê sinc bi serbestî, bê tirs û bê şerm tawanên xwe li dijî kurdan pêktînin. Kuştin, dizî, talan, revandin, êşkincekirin, destdayîna li ser zeviyên zeytûnan û gellek tawanên ku asta hovîtiyê derbaskirine dikin, û li gorî tawanên xwe yên kirêt fermanan derdixînin, ne tenê wiha, lê xwe bi wan kiryaran paye dikin, vîdyo û wêneyên kiryarên xwe bê şerm û fedî diweşînin.

Ev kesên tawabar û qirêj ku îro çarenûsa gelê me li çiyayê kurmênc ketiye destê wan, bi pilansazî û biryara Turkiyê dixwazin siyaseta erebkirin û turkirina Efrînê pêk bînin, bi hezaran ji kurdên Efrînê koçberkirin, û fişarin dijwar li yên mayî jî dikin da ku wan neçar bikin ku dev ji devera xwe berdin, li şûna vê yekê bi hezaran ji malbatên çeteyan û koçberên ku ji deverên sûrî yên cuda derketibûn li Efrînê û di malên kurdan de cîbicî dikin.

Herwiha xwendina bi zimanê erebî û turkî feriz dikin, û astengiyan li ber çand û zimanê kurdî datînin.

Hemû cûreyên tawanan û siyasetên nijadperestî ku li ser dirêjahiya dîrokê derheqê kurdan hatibûn bi kar anîn îro li Efrînê tên bi kar anîn, hemû siyaset û tawanên hovane yên ku dijminên gelê kurd li Dêrsim, Helebçe, Mehabad û Kerkûkê bi kar anî bûn, li Efrînê hatin bi kar anîn, wek ku ew bajarên kurdistanî li hemberî wan tawanan li ber xwe dan û kesayeta xwe ya kurdî û kurdistanî wenda nekirin, herwiha Efrîn jî wê bimîne deverke kurdî, û dagîrkirên wê ji bilî rûreşiyê tişekî din bi dest naxin. ■

تَبنَّى ثورة
adopt a revolution

الوقت كله لك

فيروز رشك

أكثر الطرق سلاما
تنتظرني
ها قد اندلع خيالك
أطفأ لهيب الحرب
همسك انهمر على الفراغ أسفل الروح
فكانت حقول النعناع
يداك بينها
تلتقط أسى غيابك
لا أجيد فيه سوى الدمع
الوقت كله لك
تشرق في عيني قبل الشمس
توقظ الطواحين من رقادها
هنا أنت
لم يعد ما يسمى أنا دونك

تأخرت مواسمي كثيرا
ما سقط الحب
ولا سقط المطر
كن
أكون
امرأة تسير بأرجل قلبها
يتفتح القرنفل من مساماتها
و يغفو جرحها بمقدار أغنية
الوقت كله لك
عتبات الكلام الأولى لذيذة ككرز شفتي
و كمائن شرود خيالي
في استضافة طيور تنقر ذاكرة القصيدة
حين تكون...
قلبي كطبل إفريقي يدقه كردي مجنون ■



NERÎNEKE DERIZÎ

Nûh Silêman

Di neynika ku ji ser maseyê hatiye xwar
ez li riwê xweyî derizî dinerim
nerînên xweyî rast û teze
ez difroşim hemî aliyên riwê xwe
lê belkî.. ew jî derizî li min vedgerin
û belkî hemî tişt di nijada xwe de
ji derizandinê çêbûne.
Ew ez im
yê ku li pişt min rawestiyaye
pişta xwe daye dîwarekî derizî
û riwê minî ku
perçe perçe bûye
di cama pencerê de
li pişt min dide hev
ez wî nabînim
lê ez zanim ku ew li pişt min e
ewê derizî
Dibe ku gava bavê min û diya
min ji hev hezkirin
tiştek di hundirê wan de derizî bû
dibe ku ew tişt ez im
lewra bi peyala xweyî derizî
ez gelek tiştên ku di hundirê min de
derizîne av didim
lewra ku ejî
di hundirê gelek tiştan û gelek kesan de derizî me
bersivên xav malzaroka pirsên vala ne
di cama pencera derizî de
ew li cîrana min a derizî dinere
cirana min a ku dixwaze
cama wêneya bûkaniya xweya derizî bughêre
ziq li wêneyê dinere
dibe ku ji bilî cama wêneyê
gelek wêne di hundirê wê de derizî bin
yê ku li cîrana min dinere
ewê ku li pişt min rawestiya ye
ew jî ez im
ez yê ku derizandineke piçûk im
di hundirê derizandineke mezin de
mezin dibim ■

JIN Û MAFÊ PAŞMAYÊ LI WELATÊN MISILMAN.. TÛNIS WEK NEMÛNE

Anya Darî

Jin li welatên misilman, ji asantrîn mafên xwe bêpar e, çiku jin li van welatan bi çavekî biçûk û jêrîn tê pîvan, herwiha serweriya mêran li tevahiya civakên misilman rê nade jinê ku mafên xwe bi dest bixe. Wekî ku çawa berê di serdemên nezaniyê de, jin bi zindî dihate bin axkirin, û gellek mafên ku ji mêr re derdiketin, bi dest jinê nediketin, herwiha di serdema desthilatdariya misilmantiyê de jî jin ji gellek mafan pêpar ma.

Yek ji van mafan, mafê jinê di paşmayê de ye, ew jî li gorî ayîneta misilmantiyê ya ku wekhevî di navbera jin û mêr de peydanekiriye, di parvekirina pêşmayê de para mêrekî wek para du jinan tê pîvan.

Lêbelê, berovajî hemû welatên misilman, komara Tûnisê dîwarên kevin û kerkote şikandin û zemîneke guncav bo pêkanîna wekheviyê di navbera herdu zayendan de durust kir.

XolyaTûnisê, jinav weltên misilman, ber bi sererastkirin û guhertina yasayan ve li gorî rewş û bejna civakê, di warê mafên jinê de, gavinin cuda û cihê davêje, çiku komara Tûnisê bi awayekî rojane xwe nû dike, da ku yasayên wê li gorî berjewendiyên hemwelatiyên wê bin. Jina Tûnisî jî, ji vê nûkirinê bê par nema ye, dêmek wekhevî di navbera wê û mêr de tê dabînkirin.

Di 13ê Tebaxa sala 2017an de, ku rêkeftiye roja cîhanî ya jinê, komara Tûnisê deriyê gotûbêjan li ser mijareke ku li cîhana misilmantiyê qedexe ye vekir, ew jî, dema ku serokê Tûnisê Elbacî Qayd El-sibsî daxwazkir ku di warê mafê paşmayê de, jin û mêr wekhev bin, û ev mijar yekser girêda mafên mirov, bêhtirî ku mijareke olî be. Vê yekê, nerînên cihêreng di navbera razîbûn û nerazîbûnê de derxistin holê. Miftiyê Komara Tûnisê, ê ku bilindtirîn desthilata olî li komarê ye, li dijî vê dozê derket, herwiha mizgefta El-ezher a pîroz li Misrê jî, daxwazên El-sibsî wekî dijminayî û binpêkirina ayîneta Islamê bi nav kir.

Vêca di 13ê Tebaxa sala 2018an de, serokomarê Tûnisê "El-sibsî" pêşniyarkir ku wekhevî di navbera jin û mêr de bibe yasa, di gel ku rê ji kesê paşmandar re hebe ku vegere ayîneta misilmantiyê eger bixwaze. Li gorî vê yasayê, Tûnis yekemîn dewleta misilman e, ku yasaya wekheviyê di navbera herdu zayendan de, di warê paşmayê de radighîne, herwiha El-sibsî got ku welatê wî dê wekheviyê ne tenê di warê paşmayê de pêkbîne, lêbelê ew ravajtinê dike da ku vê wekheviyê di tevahiya waran de cîbicî bike.

Lê, li dewletên misilman yên din, hîn jî yasaya paşmayê li gor ayîneta misilmantiyê hatiye ristin, ku mafê mêr di paşmayê bav û dê de, du par in, û yê jinê tenê parek e, dêmek li gor ayîneta Islamê divê ku mêr li jinê xerç bike, û bi vê yekê, para jinê herî kêm, dibe wekî ya mêr, yan jê zêdetir jî dibe, ji lewra ayîneta Islamê nîvê para mêr daye jinê,

Belê, binpêkirina ku dermafê jinê li civakên misilan tê kirin, wê ji gellek mafan bêpar dike, wekî mînak, kesê paşmandar, berî ku bimre paşmayê xwe li ser zarokên xwe yên nêr belav dike, û zarokên xwe yên mê ji vî mafî bêpar dike, û carnan jî piştî mirina bav û dê, bira dest datînin ser paşmayê bi behaneya ku wan karkirine û bi kedê dane ser hev, an jî bi riya sextekirina belgeyan vê yekê ji xwe re rewa dikin, herwiha carnan jî fortan li jinê dixwin da ku ji mafê xwe yê di paşmayê de ye dakeve, ji bo ku malbata xwe ji dest nebe, ji lewra komara Tûnisê yekemîn dewleta misilman e, a ku di warê kêşeya paşmayê de, ayîneta misilmantiyê û yasayan ji hev cihê û cuda dike, û wekheviyê di navbera jin û mêr de dabîn dike.

Wekî gotina dawîn ,jin nîvê civakê ye, ji lewra pêwîst e em baş zanibin ku eger ev nîv pûç be, dê civak jî seqet be, û eger ev nîv çalak be, her wê civak saxlem û durist be, û helbet nivîsek wiha kurt vê babetê têr nake, lê dimîne nerînek derbarê rewatiya pêkanîna wekheviyê di navbera jinê û mêr de ye, nemaze di warê paşmayê de. ■

NAVDARÊN KURD

MEYREM XAN



Şevîn Hesen

Hunermend û dengbêja kurd Meyrem Xan, xatûn û şaha dengbêjiya kurdî ye , xwediya dengê zîz û zelal e , stûna dengbêjiya resen e .

Meyrem Xanê, di sala 1904 an de li gundê Dêrgolê yê girêdayî bajarê Şêrnaxa bakurê kurdistanê ye ji dayik bûye.

Hin jêderin cuda dibêjin ku ew ji Nisêbînê ye, û hin din dibêjin ku ew ji malbateke Bedirxanî ye.

Bi fermana sultanê Tirk re , sala 1915 an, malbata Meyrem xan koçber dibe, destpêkê li Qamişlo, piştire li Şamê bi cih dibe.

Li Şamê, Meryem xan mîrek Bedirxanî nas dike, û evînek kûr di navbera wan de çêdibe.

Hin jêder dibêjin ku ew zewicîne, û ji ber ku hevserê wê destûra karê huner û dengbêjiyê nedayê , wê dev ji wî berdaye, lê hin jêder jî dibêjin ku wan demekê ji hevûdu hezkirine paşî dev ji hev bedane bêyî ku şûkirin di navbera wan de bibe , ji ber veqetîna ji yarê xwe û êşa evînê, Meryam Xan ji wir koç dike û berê xwe dide Iraqê , demekê li Mûsilê dimîne , piştre diçe Bexdayê, û li mala keça apê xwe Elmas xan Mihemd bi cî dibe , piştre Meryem xan ji mala keça apê xwe jî cihê dibe û malekê ji xwe re kirê dike.

Di sala 1935an de, li ezgeha Bexdê, di beşê kurdî de dest bi kar û xebata xwe ya hunerî dike. Wê hingê destpêka weşana vê ezgehê bû.

Jiber zîrekî û jêhatîbûna wê rêveberiya beşê kurdî di ezgeha Bexdayê de dike.

Di wê dema ku civaka kurdî hunermendî û dengbêjiya jinê weke şerm û qephetek mezin didît, Meryem Xanê bi tenha xwe tekoşîneke bê hempa li hemberî vê hişmendiya teng û paşverû dikir, bi vîna xwe ya pûlatî û hezkirina xwe ji hunerê re gellek astengî derbas kir û dikarîbû navê xwe di cîhana hunera kurdî de kûr bikole, û bighêje asta hunermendên serdema xwe yên navdar û bejinbilind wek nemir Mihemed Arifê Cizrawî

Meyrem Xan yek ji jinên kurd yên pêşeng bû ku riya hunerê û dengbêjiyê girtin, tevî ku ev rê ji jinê re qedexe bû, û pir pirsgirêk, arîşe, qerwelk û serêşî ji dû wê digihanê, lê hunermenda me ranewestiya û gavên xwe bi bawerî di vê riya qeşeng de tavêtin.

Meyrem Xanê yekemîn jina kurd e, a ku bi wêrekî stranên xwe tomar kir û bi riya kasêtan stiranên wê hatin belavkirin, bi vê yekê tê hejmartin yek ji nav hunermendên kurd yên ku stranên folklorê kurdî parastin û bi dengê xwe ji bo nifşên li dû xwe veguhestin

Herwiha Meryem xan vedana dengê netewa xwe bû , ji ber ku di ezmanê dengbêjiya kurdî de dengbêjên wê demê serkêşê strana netewî ya kurd bûn, ku Meryem xanê jî yek ji wan e , û ew di vî warî de aleke berz û bilind e.

Di stranên Meryem xanê de, evîn û hezkirina welêt diyar û xwiyanî ye.

Di wan stranan de gellek serpêhatiyên kurdan derbas dibin ; mîna strana "karwanê mala bavê sêvê, Mehemd Selîm zavakî taz e , wa axawo"

Meryem xan di koşk û dîwanxaneya malbatê de helbestvan , nivîskar û kilambêj dicivandin, deriyê mala wê ji hemû hunermendên kurd re herdem vekirî bû.

Hunermenda kurd Meryem Xan ji bo hunera kurdî gelek rexneyên tûj ji civaka girtî dîtin û pir zehmetî di jiyana xwe de kişand.

lê viyan û hezkirina wê ji hunerê re ji van astengiyan tevan xurtir bû , lewre karîbû bibe stûnek ji stûnên hunera kurdî.

Dengbêja hêja Meryem Xan temenê xwe di nava xizanî û rebeniyê de buhirand, dawiyê ji ber nexweşiya gurçikan ve jiyana xwe ji dest da.

Hin jêder dibêjin ku ew di sala 1949 an de li Bexdê çû ser dilovaniya xwedê

Xatûn û şaha dengbêjiya kurd Meyrem xan ta di dema nexweşiya xwe de jî distra.

Bêhtir ji 200 stran û gelek sêlikên wê hene,

Meyrem xanê oxira xwe ji feleka xwe ya bêbext xwest , lê bi kilam û stranên xwe, kaniyeke zengîn û zelal ji guhdarvan û hunera kurdî re hişt.

استفحال ظاهرة العنوسة و الحلول المقترحة

خلقت الأزمة السورية المستمرة الكثير من المآسي و المشكلات على مختلف الصعد، ومسّت تفاصيل حياة الناس بكلّ أبعادها الاجتماعية و الاقتصادية و النفسية.

يعد ارتفاع نسبة العنوسة في المجتمع من أخطر الأزمات الاجتماعية التي باتت تعاني منها الأسرة السورية و قد تحولت إلى ظاهرة واسعة الانتشار بل تكاد تكون سائدة في مجتمعنا.

إن الأسرة هي الركيزة الأساسية لبناء المجتمع ، و تكوينها هو شرط أساسي لاستمرارية المجتمعات, و من هنا ينبع أهمية تناول مشكلة العنوسة و البحث عن حلول لها .

لقد بات تفشي ظاهرة العنوسة يشكل تهديدا جديا على مستقبل الأسرة السورية في كل المدن و المناطق ومنها منطقة الجزيرة حيث تشير إحصائيات نشرت في الآونة الأخيرة إلى أن نسبة العنوسة قد تجاوز ٦٥٪ . أما عن الأسباب التي تقف خلف هذه النسبة العالية فهي متعددة من أهمها الغلاء المعيشي و ارتفاع تكاليف الزواج التي تفوق طاقة الكثير من الشباب, اضافة الى هجرة أعداد هائلة من الشباب خاصة الذكور منهم إلى الخارج و خوف الشباب من المستقبل في ظل عدم وجود أفق لحل الأزمة السورية ناهيك عن مقتل و استشهاد الآلاف من الذكور في المواجهات المسلحة مما اثر على التوازن بين نسبة الذكور و الإناث في المجتمع .

كل هذه الأسباب و غيرها أدت إلى تفاقم ظاهرة العنوسة

اما عن السنّ الذي يعتبر معيار العنوسة فهو يختلف من مجتمع لآخر و هذا يتوقف على ثقافة المجتمع و وعيه.

إن تأثير العنوسة على الإناث هو أكثر بكثير عن تأثيرها على الذكور و قد تتحول إلى شبح ينغص حياة الكثيرات منهن

حول هذا الموضوع تحدثت الفتاة (د_ا) لمجلة ولات معبرة عن معاناتها قائلة :

«عندما كان عمري ٢١ سنة تقدم لخطبتي احد الشباب و

أرسل أهله إلى منزلنا يطلبونني للزواج بابنهم حيث جاؤوا ليأخذوا موافقة مبدئية من أبي و أمي ليأتوا فيما بعد بشكل رسمي وفق العادات والأعراف المتداولة عندنا, و بينما كانوا يتناقشون مع أهلي في الموضوع جاءت أختي التي تصغرني لتخبرني بأن الجماعة جاؤوا لكي يخطبوني لابنهم, في تلك اللحظة شعرت بوخزة في جسدي و فرحة ظهرت على شكل ابتسامة لاحظتها أختي حينها.

لكن المشكلة كانت في وجود أخت عزباء اكبر مني في البيت حيث امتنعت أمي عن الموافقة على زواجي قبل أن تتزوج الأخت الكبرى و هكذا تكررت القصة و تقدم لخطبتي العديد من الشباب و لكن أمي لم تغير رأيها و كانت ترفض لنفس السبب .

مرت الأيام و السنين و أختي التي تكبرني لم تتزوج و أنا بقيت هكذا عزباء حتى الآن.

وها هو عمري قد أصبح ٣٣سنة و مازلت عزباء, إنني ناقمة على تلك الذهنية التي وقفت في وجه نصيبي و منعتني من حقي في الزواج .

الآن ما عدت اهتم بموضوع الزواج و لا أبالي إن تقدم احد لخطبتي أم لم يتقدم.

أنا اعلم بان نسبة كبيرة من الشباب قد هاجروا و إن نسبة الزواج قد انخفضت كثيرا في مناطقنا بسبب تكاليفها الباهظة.»

وللوقوف على أهم أسباب ظاهرة العنوسة و الحلول الممكنة للحد منها التقينا بالناشط المدني عماد احمد و الذي قال :

«باعتقادي السبب الرئيسي لانتشار هذه الظاهرة يعود لارتفاع تكاليف الزواج ابتداء بالمهر وصولا إلى المصاريف الأخرى و التي لا طاقة للشباب على تحملها و هذا ما أدى إلى عزوف الآلاف من الشباب عن الزواج.

و لمواجهة هذه الظاهرة لابد من حملة توعية شاملة يشارك فيها قادة المجتمع و المؤسسات المؤثرة كالمساجد و منظمات المجتمع المدني للحد من تكاليف الزواج الباهظة و تشجيع الشباب على الزواج .» ■



TIRŞBÛNA SIMAQÊ

Vejîna Kurd

Dem bi gavên xemsar dimeşiya û tûrikê êşan bi ser kêlîkên bêbext de dadiweşand. Xelo mîna hemû nîştecihên Efrînê êşên rengereng dicûtin. Piştî nîvê şevê derbas bû ew bi xew ve çû. Pêjna bavê wî ji dûr ve xuya bû û gotê: Kuro! Zeviyên xwe bûr mehêle.. Bila zeytûn û simaq sêwî nemînin. Xelo ji xew hişyar bû û zanî ku ew xewn bû lê vedenga gotinên bavê wî mîna pêlên deryayê di guhên wî de dubare dibû.

Bi tîrêjên rojê yên yekem re Xelo bi gavên vîndar berve zeviyê xwe meşiya.. Ew çolbir çû ta ku çavên wî li çeteyên rihdirêj yên ku li ser rêbenda li ber gund rûniştine nekeve. Dema ku ew gihîşt nav zeviyê xwe Xelo hinekî xemên xwe ji bîr kirin û hilma axê bihna wî fireh kir. Sorbûna teneyên simaqê bi Xelo re dikeniyan û lavayên çinînê jê dikirin. Lewre wî bi dilekî xweş kêrek ji berîka xwe derxist û dest bi çinîna simaqê kir. Di wê kêlîkê de Xelo ne tenê simaq diçinî lê wî gelek bîranînên xwe yên ku li bin dara zeytûnê raketî bûn berhev dikirin û bi bîr ve diçû. Belê.. Ew di heyameke pir xweş de bû dema ku du çete berve wî hatin. Jinişkêve yekî ji wan devê çeka xwe da ser pişta wî û bi zimanê Erebî gotê: Tu li va sibehê çi karî li vir dikî?

Xelo bi paş xwe ve nêrî, ziq li çavên wî mêze kir û bi zimanekî Erebî yî jihevketî gotê: Ez li nav zeviyê xwe me û li ser xaka xwe me. Ez berê simaqa xwe diçinim. De bêje hûn li vir çi dikin?!

- Ahaa.. Simaqa xwe! Kê gotiye ev zeviyê te ye? Bêguman tu diz î.

Çeteyê din got: Ez bi guman im ku tu yek ji teroran î.

Xelo bi hêrs bersiv da û got: Hûn diz kurê diza ne. Hûn hêlûna terorê ne. We Efrîn bi tevahî dizî we tişt bi me nehîşt. Êdî bes e ji we re.. Xaka me bi gavên xwe genî mekin.

Di wê kêlîkê de xwîn di serê Xelo de keliya.. Hemû bûyerên xwînî yên ku ji 20 Çile de heya vê rojê qewimîne mîna kurtefîlmeke êşdar di pêş çavên wî re derbas dibûn. Wî kêra xwe rakir ku tola hemû pakrewanên gelê xwe hilîne lê çeteyan fersend nedanê... Yekî ji wan fişekek di sîngê wî yê pîroz de çand û xwîna sor careke din tevle axa pîroz bû! Simaq jî di tirşbûna xwe de gevizî û gevizî. ■

10.6.2018

البطالة المقنّعة في مؤسسات الإدارة الذاتية- إقليم الجزيرة

تقرير: ميثان إبراهيم

تعدُّ البطالة من أهمّ المشكلات التي تواجه المجتمعات الإنسانية في العصر الحديث، وتشكّل عقبة كبيرةتحول دون تنميتها وتقدّمها وازدهارها، مشكلةتُثقل كواهل أفرادهذه المجتمعات من جهة، والحكومات القائمة من جهة أخرى. والبطالة اصطلاحاً تعني: «عدم توافر فرص العمل للقادرين عليه». وقد عرفتها منظمة العمل الدولية بأنّها: «لفظ يشمل كلّ الأشخاص العاطلين عن العمل رغم استعدادهم له وقيامهم بالبحث عنه مقابل أجر أو لحسابهم الخاص، وقد بلغوا من السنّ ما يؤهّلهم للكسب والإنتاج». ولكي يُعتبر الإنسان عاطلاً عن العمل، يجب أن يكون: قادراً عليه، وباحثاً عن فرصة في مجالاته، ويكون على استعداد كامل له في حال توافر هذه الفرصة. أما أهم الأسباب التي تؤدي إلى انتشار هذه الظاهرة بين صفوف الشباب خصوصاً: ضعف الأداء الإقتصادي بشكل عام، وعدم وجود توافق بين مُتطلّبات سوق العمل والكفاءات والتخصّصات المتاحة. إلا أن السبب الرئيسي يكمن في عدم الاستغلال الصحيح للثروات الطبيعية للبلاد.

يتحدَّث الباحثون عن أنواع البطالة بالقول: هناك البطالة الاحتكاكية: هي الناتجة عن تنقّل الأفراد من عملٍ لآخر نتيجة حدوث تغيّرات في الأوضاع الاقتصادية للبلاد. والبطالة الهيكيلة: الذي تشير إلى عدم تكافؤ توزيع القوى العاملة حسب مقدار الحاجة إليها. والبطالة الدورية أو الموسمية: وهي البطالة التي تظهر بسبب عدم قدرة سوق العمل على استيعاب أو شراء الإنتاج المتاح. أخيراً البطالة المقنّعة: وهي التي تعنينا كموضوعلهذا التقرير. وتعني البطالة المقنّعة إشغال عدد من العمال غير المنتجين للوظائف بشكل يفوق الحاجة الفعلية،أي مبدأ: (فائض عن الحاجة) بحيث لو سُحب هؤلاء العمال من وظائفهم، فإن مقدار الإنتاج لن يتأثّر بصورة ملموسة.

البطالة المقنَّعة في إقليم الجزيرة و أسبابها:

إنَّ البطالة هي من أكثر المشكلات التي تواجه الشَّباب بشكل عام، وتؤثّر على المجتمع تأثيراً سلبياً من كافة النواحي الاقتصادية والاجتماعية والنفسية كما سبق الذكر. ومن الإنصاف القول – بدايةً – بأنَّ الإدارة الذاتية الديمقراطية عملت خلال السنوات الماضية للقضاء على البطالة بفعالية كبيرة، وسعت لإنهاء هذه الظاهرة الآفة، على الرغم من ظروف الحرب القاسية التي تمرُّ بها البلاد منذ ما يربو على السبع سنوات، من خلال إيجاد الآف الوظائف الشاغرة للشباب بشكل خاص، ولولا هذا الأمر لكانت الأمور في هذا المجتمع سيئة للغاية. إلا أن ذلك لم يمنع من انتشار ظاهرة (البطالة المقنّعة) التي تعني وجود أعداد من الأيدي العاملة؛ تزيد عن الحاجة الفعلية للهيئة أو المؤسسة. وقد سميت بهذا الاسم لأن العامل – هنا – يحصل على أجور دون مقابل مكافئ من العمل، والحقيقة أنّ خطر البطالة المقنعة لا يقلُّ البتَّة عن مخاطر البطالة الظاهرة.

إنَّ المتتبع يلاحظ انتشار هذا النوع من البطالة في بعض هيئات ومؤسسات الإدارة الذاتية في إقليم الجزيرة لعدّة أسباب منها: إتباع هذه الإدارة سياسة الإستيعاب، وسعيها لتأمين فرص عمل لأكبر عدد من العاملين بغض النظر عن التخصصات، بحيث أدت هذه السياسة إلى زيادة في القوى العاملة في بعض الوظائف، ونقص في بعض التخصّصات. وأيضاً عدم توافر الخبرات المؤهلة لانتقاء العاملين بحسب مؤهلاتهم، إلى جانب نوع من الفساد الإداري والذي يُعتبر سبباً رئيساً في تعيين العاملين دون الأخذ بعين الإعتبار الكفاءات والمؤهلات اللازمة، وانتشار ظاهرة الواسطة والمحسوبيّة، وعدم جعل الكفاءة المِعيار الأول للاختيار.

آثار البطالة المقنَّعة في إقليمالجزيرة،وشهادات حيّة:

للبطالة عموماً العديد من الآثار السيّئة التي تُخلّفها في الفرد والمجتمع، ومنها: ارتفاع مُعدّلات التضخم، إذ أن العلاقة بين البطالة والتضخّم علاقة طردية؛ فكلّما زادت البطالة قلّ الإنتاج. وأيضاً تدني مُستوى الإنتاجية للعاملين،وانخفاض ربحية المؤسسة المشغلة، وازدياد اللجوء للهجرة وخصوصاً عند الذكور، بسبب عدم تأمين إحتياجاتهم المتنوعة. إضافةً إلى حرمان المجتمع من بعض الطاقات التي يحتاجها المجتمع وقد أخذ مكانهم أناس لا يمتلكون تلك الطاقات. وتزايد مشكلات اجتماعية مثل السرقة

– رابعاً) المحور الإجتماعي: ينمّي الإنترنيت مفهوم الحياة الاجتماعية لدى الطفل، ويساعده في عملية التكيُّف مع البيئة المحيطة به، واكتساب السلوكيات التي ترسّخ علاقات إجتماعية سليمة، والقواعد الأساسية التي تنظّم تلك العلاقات. هذا إضافة إلى خدمات المراسلة والبريد الإلكتروني، وإمكانية التصفُّح في أيّ مكان يريده.

سلبيات الإنترنيت:

بالرغم من الجوانب الإيجابية لهذه الوسيلة الحضارية، فإنه بات يشكّل مصدر قلق للكثير من الآباء والمربين، لاسيما بعد الانتشار الهائل للشبكات والمواقع التي تتعدّد أهدافها وغاياتها ومصادر تمويلها، ومع قضاء الأطفال للكثير من الوقت أمام شاشات الإنترنت، لحدٍّ قد يصل إلى الإدمان.

وتشكّل طبيعة الموادّ التي يطالعونها الأطفال أولاً، والفترات الطويلة التي يقضونها أمام هذه الشاشات ثانياً، أهم المشكلات مع الإنترنيت. لذا نرى من المفيد تسليط الضوء على الآثار السلبية الناجمة عن الاستخدام السيء والمفرط للإنترنيت، من أهم تلك الآثار:

– أولاً) التأثيرات السلبية التي تفرزها مشاهدة بعض البرامج والأفلام والمسلسلات التي تحتوي على أفكار وقيم لا تتناسب مع خصوصية الطفولة، وطبيعة المراحل التي يمرّونُ بها الأطفال. من جهة أخرى احتواؤها على مفاهيم عقدية أو فكرية غريبة عن الأعراف الدينية، وعادات لا تنسجم مع ثقافة المجتمع الذي يعيشون فيه.

– ثانياً) الآثار التي تفرزها محاولات الطفل استكشاف بعض المواقع، كمواقع العنف والمواقع الإباحية، ومواقع الشذوذ والانحراف السلوكي، وما تشكّلها من ضرر في توجيه سلوكياته، ودمج قيم مختلفة في شخصيته. إضافة لما تكرّسها من القيم السلبية، كالعالم الذي يعتمد على الصراعات، أو الحلول السحرية للمشكلات والمواقف.

– ثالثاً) التسبّب في اضطرابات صحية ونفسية عدَّة للأطفال، نتيجةً الإدمان على الإنترنيت، منها: اضطرابات النظام الغذائي، ومشكلة زيادة الوزن. والعرضة للإصابة باضطرابات ما قبل النوم وأثناءه أكثر من غيرهم. ناهيك عن مشاكل نفسية أخرى، كسرعة الانفعال، والجنوح عن الواقع, والبرود العاطفي والتقلّب المزاجي، والانعزال والانطوائية.

– رابعاً) حرمان الطفل من فوائد الحوار والمشاركة والتفاعل الأسري الطبيعي وإيجابياتها، وضعف اكتساب مهارات التواصل مع الآخرين، حيث أن الاستخدام المفرط للإنترنت يؤثر سلباً على علاقات الطفل الأسرية، ويخلق فجوة إجتماعية نتيجة العزلة التي يفرضها التعاطي السلبي مع هذا العالم الافتراضي.

– خامساً) حرمان الطفل من ممارسة الأنشطة الثقافية والفنية، التي يحتاجها نموّه الفكريّ والجسديّ والاجتماعيّ، والتي من المفترض أن يُخصّص لها الوقت الكافي، كالقراءة والرياضة. ولا ننسى التأثيرات السلبية للإسراف في الجلوس أمام الحاسب، كالشعور بالتعب والإرهاق والخمول، وإهمال الواجبات المدرسية، وغيرها من المشكلات.

– سادساً) تعرّض الطفل لممارسات ضارَّة ، قد تصل إلى حدِّ تهديده أو ابتزازه أو استغلاله استغلالاً غير مشروع.

الأطفال والإنترنيت.. الإيجابيات والسلبيات

عبد المجيد قاسم

لقد تطوَّرت وسائل الإعلام باختلاف أنواعها تطوراً مذهلاً، واستطاعت أن تدخل إلى كلّ بيت، وأن تخاطب كلّ فرد من أفراد المجتمع، وتحيط بهم إحاطة السوار بالمعصم، حيث التلفاز، والإذاعة، والهاتف المحمول، والحاسبات الشخصية، وشبكات المعلومات المتطوّرة، نتيجةً لما أحرزه الإنسان من التقدّم العلمي والتقني، خصوصاً في مجال الاتصالات وتكنولوجيا المعلومات.

لم يعد خافياً أن هذه الوسائل تؤثر في نمو الأطفال تأثيراً كبيراً من النواحي النفسية والفكرية والقيمية والسلوكية، وتشكّل مصدراً مهماً لمعارفهم وخبراتهم، وتفتح أمامهم آفاقاً استكشافية واسعة. من جهة أخرى فإن من خصائص هذا العصر الذي نعيشه، أن الأسرة والمدرسة لم تعودا وحدهما مصدرا للثقافة والمعرفة الأخلاق، بل ظهرت وكالات اجتماعية ووسائط معرفية وثقافية أخرى تشاركهما هذا الدور، وتقدّم للأطفال المادّة المعرفية والثقافية والقيمية باختلاف أشكالها.

والإنترنت كأهم أنواع وسائل الإعلام الحديثة، يُعرف بأنه شبكة حاسوبية دولية عملاقة، نشأت من قِبل وزارة الدفاع الأمريكية، عام ١٩٦٩م عندما قرّرت إنشاء وكالة مشاريع للأبحاث المتقدّمة. ثم تطوّر الأمر بدءاً من ثمانينات القرن العشرين، حتى وصل لقيام بعض الدول ببناء شبكات خاصة بها، وصولاً إلى ربطها بشبكة واحدة، وكان ذلك قفزة هائلة جداً في هذا المجال. وقد أصبحت هذه الشبكة جزءاً هاماً في حياتنا، وتسهم في صياغة قيمنا واتجاهاتنا ورؤيتنا للحياة، وضرورة لم يعد بالإمكان الاستغناء عنها، سواءً كأفراد أو مجتمعات.

إيجابيات الإنترنيت:

يجمع الإنترنيت بين الكثير من المزايا التثقيفية والتربوية والترفيهية بالنسبة للأطفال، نتعرَّف عليها من محاور عدّة:

– أولاً) المحور التربوي: يسهم الإنترنيت في تنمية شخصية الطفل، وتوسيع أفكاره ومداركه، وتطوير إمكاناته وقدراته المعرفية والفكرية والتعبيرية واللغوية. فقد أصبح مصدراً هاماً للمعلومات، ورافداً من الروافد التي تمدُّه بالعادات والقيم والاتجاهات، بل منظومة تربوية متكاملة تماماً، إذا ما وظِّفَ بشكل سليم.

– ثانياً) المحور التثقيفي والتعليمي: يشكّل الإنترنيت وسيلة هامة لتطوير ثقافة الطفل، ويتيح له التعرّف على أحدث المعارف والاكتشافات، والاستفادة من خدمات المواقع الثقافية والمكتبات الإلكترونية. كما يؤدي دوراً إيجابياً في عملية التعليم، ويمتلك ميّزات كبيرة في تزويده بخبرات متنوّعة. ناهيك عن تعزيز المفاهيم الإيجابية حول القيم الثقافية والتعليمية الحديثة.

– ثالثاً) المحور الإنفعالي: يؤدي الإنترنيت دوراً فاعلاً في تهذيب إنفعالات الطفل، ومعالجة بعض المشكلات النفسية، يضاف إلى ذلك فضائل الحوار والتفاعل، وتبادل الأفكار والآراء مع الأقران، وإشاعة أجواء البهجة والمتعة والتشويق، كونه يجمع بين المادّة المسموعة والمرئية والمقروءة، وما يحمله هذا الجمع من الموسيقا واللون والحركة المتواترة.

والنهب والاحتيال، وانحلال القيم والمبادئ الأخلاقية بسبب الفراغ والحاجة للمال.

لقد رصدنا في هذا التقرير آراء البعضعن هذه المشكلة الاجتماعية من مجتمع الجزيرة:

– وليد محمد علي، طالب جامعي: (٢٢ عاماً) إن مشكلة البطالة عموماً تُوصد الأبواب أمام الخبرات الناشئة للإسهام في تنمية المجتمع، وتؤثر عليها سلباً بكلِّ تأكيد، والبطالة المقنَّعةأعتبرهامن أسوأ أنواع البطالة، لأنها تقدِّم الفرصة لغير مستحقّيها، فتكون الإنتاجية منخفضة من جهة،ويعتبرون هؤلاء فائضين عن الحاجة من جهة أخرى، مما يناقض مع مبدأ (الخبرة والكفاءة في مكانها الصحيح) وبذلك ينتشر الفساد داخل المؤسسة التي يزداد فيها أعداد هؤلاء، وتجري عمليات التوظيف بالواسطة والمحاباة.

– س. م، خريج معهد متوسط: (٣٠ عاماً) بالحقيقة أسمع كل من حولي يتحدثون عن انقراض البطالة في الجزيرة، إلا أنني أعتقد أنهامشكلة لا تزال موجودة، خاصة بين شرائح واسعة من الجامعيين وأصحاب المعاهد المتوسطة، فأنا واحد ممن أعاني من مشكلة البطالة، على الرغم من تقدّمي إلى أكثر من مسابقة أقامتها الإدارة الذاتية في أكثر من قطاع خدمي في مدينة الحسكة، لذلك أتمنى ممن يصله صوتي من المعنيين متابعة الموضوع بأمانة، وإجراء مسوحات شاملة لأعداد المتقدمين لمثل تلك المسابقات لمعرفة البيانات الدقيقة والأرقام الحقيقة للعاطلين عن العمل، والعمل بجدية لإعطاء الثقة لأصحاب الكفاءات والإختصاصات بالعمل لدى قطاعاتها، وتأمين وظائف لمن يستحقها بالفعل.

– فاطمة محمد، (٣٥ عاماً) على الرغم من الجهود الكبيرة للإدارة الذاتية في القضاء على البطالة، وقد نجحت في ذلك إلى حد كبير، إلا أن هناك ما يسمى بالبطالة المقنَّعة، وهي تسبِّب بالعموم: زيادة الأعباء والتكاليف الإدارية على المؤسسة المشغّلة للعاملين، وتوزيع العمل نفسه على أكثر من شخص، مما يُقلل من إنتاجية الموظفين ويخفِّض مستوى ربحيّة المؤسسة،وفي الروح المعنوية لدى العاملين المتخصِّصين.

حلول مقترحة لمشكلة البطالة المقنَّعة:

إنّ البطالة المقنَّعة مشكلة كبيرة لا يجب تَجاهلها، بل العمل على معالجتها، ومنع تزايد مُعدّلاتها وتداعياتها في مجتمعاتنا، ومن طرق التخلّص من البطالة المقنَّعة:

– معالجة مشكلة البطالة الظاهرة أولاً، من خلال توفير بيئة مُناسبة للاستثمار، وتوسيع الإنفاق على المجالات الخدمية كالتعليم والصحة والخدمات الاجتماعية، وتوفير فرص عمل للعاطلين بحسب الكفاءة، بما يخفِّض معدلات البطالة.

– تأسيس جهة رسمية لتسجيل بيانات العاطلين عن العمل، وكفاءاتهم ومهاراتهم ومُقارنتها بالمهارات اللازمة للوظائف المتوافرة.

– تشجيع المشاريع الصغيرة والمتوسطة، وتأمين الدعم المالي والإداري لها، والعمل على تخريج أيدي عاملة ذوي مهارات جيدة ومناسبة،مع ايلاء ذوي المؤهلات اهتماماً أكبر.

– إجراء إحصائيات ميدانيةتشمل كلَّ الهيئات والمؤسسات لمعرفة مُعدلات البطالة المقنعة، وتحديد أماكن تواجدها.

– تحديد خصائص البطالة المقنعة من حيثُ معرفة المستوى العلمي والمهاري والعمر والجنس للعاملين لدى الهيئة أو المؤسسة.

– التعيين لدى المؤسسة حسب الكفاءات والمؤهلات مما يؤدي إلى القضاء على المحسوبيات والفساد الإداري.

YEKÎTÎ!

Ferîd Mîtan

Yek ji têgehên ku di nav gelê kurd de pirr tê gotin û bikaranîn, û ji dehên salan ve, bi awayekî rojane, di her rûniştin û hevpeyvînekê de tê ser zimanan: Yekîtî ye.

Der barê "yekîtî"yê de rist û helbest hatine hûnan, çîrok û roman hatine nivîsîn, sirûd û sitran hatine xwendin.

Gelo, yekîtîya kurdan, ango yekîtîya tevgera sîyasî ya kurdî bi çi mekanîzmê dibe, çawa pêktê ?

Di bîr û bawerîya gellek kurdan de, yekîtî ew e ku tevgera kurdî –bi tevahî- di çarçoveya yekrêxistin û yekpartîyê de tevbigere û têbikoşe! Lêna, yekîtî ne ev e; yekîtîyeke bi vî rengî li tu welatekî pêşketî û di nava tu civateke sîyasî de pêknehatiye û nayê jî.

Xeleka Windayî

Eger mirov ji destpêka sedsala 20'an ve (jidema hilweşîna desthilata osmanîyan ve) rewşa kurdistanî li ser astên navxweyî, herêmî û navdewletî binirxîne û li qonaxên şoreş û xebatên kurdan baş binihêre, wê hinge mirov dikare yekîtîya guncaw û durist destnîşan bike.

Di babeta alî û hêzên kurdistanî de, kurt û kurmancî; ne berzanî dest ji berzanîya xwe berdidin, ne apoçî, ne celalî, ne rastalî, ne jî çepalî... Jixwe ya rast ew e ku her yek li ser rêbaz û bawerîya xwe bimîne, lê gelo rêbaz û bawerîya ku peyrewên xwe ji bo doza neteweyî dixebitîne, yan jî ji bo doza kesayet û partîyan?

Di welatekî ku azadîya xwe bi dest xistibe de, hebûna partîyên xurt ên ku hevrikîya hev û din dikin û wekî çavdêran şaşî û kêmasîyên hev eşkere dikin, bandoreke pir erênî li sîstema birêvebirinê û jîyana welatîyan dike. Mebest ew e ku hebûna partîyan ji pêvajoya pêşketinê û hemi awayên xebatê re, nabe kelem. Lê di xebata tevgera kurdî de, xala ne berbiçav, tişta ku me hay jê tune, birîna kûr ku tucaran nêm nagire, navgîna gurkirina nakokîyan, ehrîmenê ku doza gîştî bi gorî berjewendîyên teng dike ew e ku ruhekî niştimanperwer ku karibe ji xebata me re bibe ol û wijdan, di nava tevgera kurdî de peyda nabin. Hişmendîya ku ne bi diruşm û slogananên beloq, lê ji dil û can karibe navnîşana "pêşî ax (Kurdistan) û milet (kurd), paşê partî û rêxistin" di navaxwe de hilgire, ji me re divê. Hebûna lêvegereke sîyasî yan jî encumeneke neteweyî ya bilind ku tevgera kurdî bi ber dewamî di bin sîwanawê de bicive ku di babetên çarenûsî de bibe xwedîya biryara dawîn, ji bo me gelekî pêwîst e.

Di alozîyan de, hevgirtin

Di herêmekê de, hebûna du bendîyan di navbera partî û rêxistinên siyasî de, tê wateya jihevketin û hevnegirtina civakê bi xwe jî; ji ber ya ku civakê ji milên sîyasî û hişmendî ve xwedî dike, tevgera sîyasî ye. Yekîtîya ku kurd dixwazin bi dest bixin, bi armanca ku karibin li hember dijmin xwe ragirin û mafên xwe bi dest bixin. Dijminê ku ji sedên salan ve ketiye pêsîra kurdan û destê xwe xistiye qirika wan, desthilatdariya tirkan e. Ji lew re dixwazim mînakekê ji nihêrîn û bawerîya tirkan der barê "yekîtî"yê de bidim:

Li Tirkiyê, bi sedên partî û rêxistinên cuda hene ku her yek ji wan xwediya hişmendî û rêbazeke cihê ye. Mirovê tirk, rastalî be yan çepalî, MHP be yan AKP, misilman be yan Xwedênenas, çi be bila bibe, lê dema ku babet girêdayî "tirk" û "Tirkiyê" be, hemî nakokîyan li pê xwe dihêle û bi zarên neteweya xwe re dibe hemnerîn û bi dengekî bilind helwesta xwe ya ku di berjwendîya tirkbûnê de ye, raber dike.

Dema ku Serokkomarê Tirkiyê Recep Teyib Erdogan amadekarîyên êrîşa li ser Efrînê dikir da ku dagir bike, partîyên sîyasî yên Tirkiyê yên rikber helwesteke li dij biryara şer nîşan da, ewan partîyan negot: "Şerê kurdan nekin, mirovine bêsûcin"; lê gotin: "Heyf e, bila ciwanên tirk li Efrînê neyên kuştin."!Li hember helwesta wan, di demekê de ku ji çar milan ve êrîşa li ser Efrînê zêde bû, nakokîyên tevgera sîyasî jî gurtir dibûn, her partîyekê partîya din tawanbar dikir. Di bûyera Kerkûkê de jî heman tişt bû, dijminan xwe kir destek û berê xwe da Kerkûkê, kurdan jî hevûdin bi xiyanetê tawanbar dikir.

Welat, xak

Bi kurtî û bi bîr û bawerî mirov dikare tekez bike ku yekîtîya herî gunaw û durist ku dikare hevgirtineke asê di civakê de bide peydakirin: Vexwarina ji kanîya niştimanperwerî û welatparêzîyê ye. ■

re axivî û got :

"Ji ber rewşa şer li Sûriyê, hejmara kakerên ku temenê wan ji 18 salan û bi jor de ne pir kêm bû, piraniya wan koçber bûn. Ji lew re em neçarbûn ku zarokan tevli kar bikin, ew jî bi razîbûna malbat û sermiyanê wan dibe."

Ibirahîm diyarkir ku:

"Gelek malbatên ku ji deverên Sûriyê yên cuda koçber bûne û li rojava bicîbûne zarokên xwe dişînin kar, ew jî ji ber rewşa wan ya abûrî xerab e. Ew ji me dixwazin ku em zarokên wan fêrî kar bikin, em jî li gorî daxwaza wan dirin, di heman demê de ji me tê xwestin-wek xwediyên kar- ku em li wan zarokan miqate bin û karên giran nespêrin wan. Herwiha em dibînin ji erkê me ye ku em van zarokan fêrî kar bikin da ku karek misoger bi destbixin pê karibin malbatên xwe xwedî bikin û di pêşerojê de bi kêrî xwe bên."

Berzan Selam zarokekî 14 salî ye, yek ji wan zarokên karker e, ji kovara welat re axivî û got :

"Ez li cem mîkanîkê erebeyan kar dikim, dixwazim fêrî vî karî bibim, hem jî alîkariya malbata xwe dikim."

Me ji Berzan pirsî: Çima tu naçî dibistanê ?

Ewî bersiva me da û got:

"Ti pêşeroj ji dibistanê nayê girtin, mesrefa dibisan û xwendinê giran e û ez nikarim peyda bikim, lê aniha ez fêrî karekî dibim û di heman demê de alîkariya bav û malbata xwe jî dikim.

Gelek hevalên min jî hene kar dikin, ez bi vî karî kêfxweşim.

Erê carna xwediyê kar bi ser me de radibe, û li me jî dide, lê ew ji bo me wiha dike da ku em zû û baş fêrî kar bibin."

Tevî ku rêxistinên civaka sivîl yên ku li Rojava kar dikin, di derbarê karkirina zarokan bi hin kampaniyan rabûn, û ji xelkê re dan xuyakirin ku cihê zarokan dibistan e, û ew agahdar kirin ku bikaranîna zarok di kar de li gorî zagonên navdewletî qedexe ye . Û tev ku ev mijar li ser dezgeh û alavên ragihandinê pircaran hatiye desnîşankirin, lê heya roja îroj hejmara zarokên ku tevlî kar dibin ber bi zêdebûnê ve ye. ■



Efsan Kurdî

Rewşa şer li Sûriyê ku ev serê heft salan berdewam e, karvedaneke mezin û xerab li civaka Sûrî û jiyana welatiyên wê kiriye.

Kuştina bi hezaran ji gel, hejmarek pir ji birîndarên cengê, têkçûna rewşa abúrî, wêranbûna pir dever, herêm û bajaran, pêlên koçberiya neçar, xizanî û pir bobelatin dîtir, pirsgirêkin kûr û dijwar li dû xwe anîne.

Vî şerê qirêj ziyaneke pir mezin gihand malbata Sûrî, ku di encam de hezarên malbatan bê sermiyan mane, an jî neçarbûn cih û warên xwe bihêlin û jiyana penaberiyê bijîn, piraniya wan jî mal û milkên wan li ber talanê çûne.

Ji nav malbatê jî, herî bêtir ziyan gihiştiye zarokan, ku ew di civakê de xeleka herî lawaz e. hejmarek pir mezin ji zarokên Sûrî sêwî bûne, hejmarek din jî ji dibistanê û xwendinê dûrketine, gelek zarok jî ji bo xwedîkirina malbatên xwe îro roj di bin kar de ne.

Vê rewşa aloz , gelek diyardenin xerab bi xwe re afirandin, yek ji wan karkirina zarokan e. ku ev yek li gorî zagonên mafên zarokan û yên navdewletî qedexe ye.

Li rojavayê kurdistanê jî hejmarek mezin ji zarokan karker hene, hin ji wan ji bo ku fêrî kar bibin û hin jî ji bo ku mesrefa malbatên xwe dabîn bikin.

Di derbarê vê mijarê de, welatiyê ji Amûdê Mihemed Ibrahîm ku ew hostayê lêkirinê bilokan e, ji kovara Welat

منهجية البحث العلمي

علي عمو

إنَّ الوصول إلى المعلومة الموثوقة ودراسة القضايا المعاصرة وفق منهجية واضحة المعالم هو من أكثر ما يهمُّ الباحثين والأكاديميين وكل متخصص في مجال عمله، ولذلك يعد البحث العلمي أداة موضوعية للكشف عن الحقائق وتفنيد البراهين أو العكس، حيث ترسخ به المعلومات وتتسع أفاق المعرفة المنهجية المستندة على البحث والتمحيص والدليل المنطقي والإحصاء والإستطلاع، فالبحث العلمي، هو عملية تقصي منظمة ومنهجية تهدف الى البحث عن وقائع وظواهر جديدة في حقول المعرفة.

ميزات البحث العلمي وأهميته:

يساهم البحث العلمي في اغناء ودعم المعرفة المسبقة، فهو يساعد على كشف الحقائق الجديدة والبحث عن المعرفة وتعزيزها، كما يساعد في تغيير وجهات النظر وتطويرها، نظرا لإستناده على البحث عن توقعات الأحداث والظواهر الجديدة، كالشروحات والعلاقات والنظريات، ولا يقتصر البحث العلمي على المواضيع العلمية والتكنولجيا فقط، وإنما يشمل مجالات اخرى كاللغات والتاريخ والعلوم الاجتماعية. وتعتبر الإبحاث ذات أهمية بالغة في سياسات الحكومات والدول المتقدمة، لما لها من شأن في اكتشاف آفاق جديدة، والمساعدة في تطبيق النظريات والمفاهيم السابقة، وإعطاء الارشادات لحل المشاكل، عدا عن إسهام الأبحاث الصناعية والتجارية في زيادة الإنتاج وتحسين الجودة.

اهداف البحث العلمي:

يهدف البحث العلمي إلى التحقق من الوقائع المهمة، عبر تحليل الحوادث والظواهر لتحديد الأسباب، واكتشاف الوقائع الجديدة، ويلعب دورا مهما في تطوير المفاهيم والنظريات والأدوات العلمية لفهم وتحليل المشاكل العلمية والغير علمية، وإيجاد حلول لها، بالإضافة للتغلب على المشاكل التي تواجهنا في الحياة اليومية.

انواع البحث العلمي:

1. **البحث الوصفي:** هو نوع من أنواع البحث، يحاول التحقيق والاستقصاء في الظواهر الجديدة، ويستخدم في دراسة العلوم الاجتماعية والبحوث التجارية غالباً، هدفه الرئيسي وصف الوضع كما هو سائد اثناء الدراسة «البحث»، وفي هذا النوع لايملك الباحث التحكم في المتغيرات، أي أنه يصف الوقائع فقط، ويستند لتقصي الحقائق المختلفة، وكمثال على ذلك دراسة النمو العقلي.
2. **البحث التحليلي:** يستخدم وقائع ومعلومات سابقة ويعيد تحليلها، لإجراء تقييم نقدي للموضوع، ويستند هذا النوع من البحث إلى طريقة الإستقصاء للحصول على البيانات، كالقيام بدراسة اسباب عدم التزام الطلاب بالدوام في الجامعات.
3. **البحث التطبيقي:** يبحث عن حلول للمشاكل الدائمة والمؤقتة التي تواجه المؤسسات أو المجتمع، ويهدف الى استخلاص استنتاج معين أولا ثم ايجاد حلول عملية للمشاكل الملحة، أو توصيات من شأنها المساعدة على الحل، كالقيام بدراسة كيفية التحكم في تلوث البيئة.
4. **البحث الجوهري:** يعتمد على التقصي عن الأسباب والمبادئ لظهور حدث أو ظاهرة أو عملية معينة، حيث يهدف إلى تعزيز المعرفة الموجودة مسبقاً، كالقيام بأبحاث حول علم الفلك.
5. **البحث التصوري:** يعتمد على الأفكار والنظريات المجردة، ويستخدم من قبل المفكرين والفلاسفة، وذلك بهدف تحسين المعرفة و تطوير المفاهيم والظواهر الجديدة وإعادة تفسير القديمة منها، كالقيام بالبحث حول الميتافيزيقية.
6. **البحث التجريبي:** يستند إلى البيانات التي تعتمد على الرصد أو الخبرات، وفيه يتمكن الباحث من التحكم بالمتغيرات، والتحقق من الإستنتاجات، كالبحث في تأثيرات العمل خلال الدراسة في الجامعة.
7. **البحث التاريخي:** يدرس الافكار والأحداث القديمة، والتي قد تتضمن فلسفة شخص أو مجموعة أشخاص في الماضي، كدراسة شخصية تاريخية.
8. **البحث الكمي الإحصائي:** هو دراسة تستخدم في البحوث التي تعتمد على قياس الكم والآحصاء، يهدف إلى بناء النماذج والأرقام الإحصائية لشرح ما تم ملاحظته، وتظهر نتائجه على شكل جداول أو رسومات بيانية او ارقام، كالبحث حول رآي الزبائن بمنتج ما.
9. **البحث النوعي:** هو دراسة تستخدم في البحوث التي تهتم بنوع الظاهرة، تستخدم المقابلات والاختبارات، وتهدف الى اكتشاف الدوافع والرغبات الكامنة لدى البشر للتعرف على المعاني والمشاعر لوصف الوضع، كالبحث حول عملية الهضم بجسم الأنسان.

وختاماً يمكن القول بأن البحث العلمي هو أسلوب منظم لجمع المعلومات الموثوقة وكتابة الملاحظات والتحليل المنطقي والموضوعي لتلك المعلومات وفق تبني سلسلة من الأساليب والمناهج العلمية بنية التوصل إلى التأكد من صحة هذه المعلومات والفرضيات أو تعديلها أو تزويدها بما هو جديد، ومن ثم التوصل إلى بعض النظريات والبراهين التي تفي بالتنبؤ بمثل موضوع الدراسة والتحكم في أسبابه أو تبعياته.

Ş E F Î Q Î S A :

Helbest giyan tije awaz û bedewî dike

Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

-Helbestvan Şefîq Îsa, destpêkê em hezdikin hûn xwe bi xwênerên kovara Welat bidin nasîn ?

-Navê min şefîq îsa ye, Ji herêma aliya me, min peymangeha çavdêriyan xwendiye , niha jî karê min ê rojane ketûber e, lê ê sereke ez terzî me û em bi vî rengî li ser darê hebûnê bi dawa jiyanî ve mane.

-kengî û çawa bayê helbestê li dilê we da ?

- Li bal gelê kurd, helbest ne tiştekî biyani ye, jiber ku Aliyê razberî digel aliyê şênberî tên ajotin, li gor xwesteka cîwerê û berdewamiya jiyanek bi çêj, ew sitiran, pend, mamik û çîrok ...hatine darijtin. Êdî vê karvedana xwe li me tevan kiriye, lê dibe ku hin ji me bihtir ev tişt wergirtine. Gundê me şînahî û kanî bûn, xelkên me jî di aliyê canê xwe de zengînbûn, û di mala me de helbestên Xanî û Cizerî dihatin xwendin, em gihan seydayê Cegerxwîn jî, lewma, hin bi hin me xwe dît ku em malik bi malik di ezmanê helbestê de dilivin.

-Helbest ji bo we çi wateyê dide ?

-Helbest, ew jî xwarina canewerî ye, giyan tije awaz û bedewî dike, û ê ku nexwînê jî lê guhdar dikê . Ew dibe çalakiyek civakî bêyê ku ew mebest be.

-Tiştê ku bala mirov dikşîne di helbesta Şefîq Îsa de, xurtbûn, zelalî û reseniya ziman e, gelo we ev ziman ji ku wergirtiye ?

-Ziman wek her tiştî ye, guhdan û sûn jêre gereke. Wek piraniya kurdan, me hin ji male, hin ji pirtûkan girtiye.

Ma ne ziman nasnama gela ye.

-Helbestên we tev trazûkirî ne, çi hêla ku hûn vê rêyê di helbestê de bigrin?

-Me xwe diye û guhê me ji awazan hes dike, helbesta terazûkirî bi hesanî dikarê hestê mirov bixwerîne, Û ev şêweyê helbestê ya resen e, û bi min xweştir e.

-di derbarê helbesta kurdî ya nûjen (bexşane) de, hûn çi dibêjin ?

-Min baş li helbestvanên helbesta nûjen guhdarî kiriye, wek mînak li başûrê Kurdistanê helbestên Ebdulah Pêşew, ku ew bi min xweş in û têr mijar in, Li rojavayê Kurdistanê jî helbestên xweş hene, çi ji berhemên helbestvanên mêr û çi ji yên jin bin, wan karîne guline rengîn biçînin.

-Hûn rewşa helbesta kurdî bi giştî çawa dinirxînin ?

-Bi rastî, berê, piraniya helbestvanan bi xwendin dibûn helbestvan, û behra bihtirîn mela bûn, lewma, helbestên wan gelekî bi rêkûpêk bûn .

Aniha, helest bi gemş û gelşa jiyanê ve girêdayî ye, û dixwazê ber bi demê ve bixişiqînê lê mixabin aloziyên rewşê ne alîkar in.

-Di derbarê berhemên we de, heya aniha çi hene ?

-Min gelek nivîsîn û min gelek avêtin, lê îsal bi riya Y.N.K.S -mala wan ava- terzedîwank derket,. Ez hîn jî dinivîsim û dixwazim hew tenê helbestê binivîsim, tev ku min hewlda ku hin şêweyê din jî ên wêjeyê binivîsim.

-Ji alî mijarê ve, piraniya helbestên we di warê rexneya siyasî de ne, gelo heya çi radeyê helbest dikare bandorê li cîweriya siyasî bike ?

-Ma ne siyaset em in, jiyana me ye, ji axiftinê ta bi xwarinê, heger çendî em xwe dûrbikin wek hin dibêjin. Lê mebesta min ji rexnan ne ku leyistokên ramyaryê ne lê ez aliyê raman ,hişmendî berçav digirim ew aliyên ku mirovan û mirovatiyê bi nanê wan dikirin û me dikin amraz ji bo kurtnerînên partîtî ez wan rexne dikim ,ma qey gelê kurd ji van partiyan ne kevintir e. Ma ne hebûna me nabê bibe gorî ti aliyan ji vî tiştî em ê bibijin wek erkekî kurdmirovatî Û guhartina cîwerê ne hesanî ye û ku bandora gotinê bi giştî neba gelekan partîperestan em ji hevaltiya xwe netavêtin û deng nedihatin kirîn.

-di warê helbestê û nivîsandinê çi projeyên we ji bo pêşerojê hene ?

-em niha penaber in û jiyana me ne hêwiriye û heger derfet çêbû ku ez berhemekî din derxînim bi min başe Min eva niha bi sernava "wê rojek bê"min derxistiye û kula min berî her tiştî zimanê kurdî ye.

- gotina we ya dawî ?

-di dawî de ez spasiya hemû karmendên kovara welat dikim û serkeftinê ji were dixwazim ku hun dibin ew girêdank û gihanoka di navebera nivîskar û xwêneran de Û karê we pîroz e Û ez dizanim rewş ji hêza welatên serbixwe mezintir e lê daxwaza min ku ti aliyên kurdî bi me neleyizin û me nekin pêkenok Û kurdistan ev welatê buhişt divê em jê hes bikin. ■